



Dr. Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :

- * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
- * Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
- * Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Hejmar (145)

Sal 25 01ê Tîrmehê 2020 z - 2632 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com

Buha (100)L.S


63 Sal Ji temenê Tevgera Siyasî ya Kurdî li Sûriyê... Em «Daim bi temerrud û şîqaq in»!



Hemîd Derwîş



Hemze Niwêran




Mihemed Elî Xoce




Osman Sebrî



Reşîd Hemo



Şewket Nesan



Dr. Xelîl Ebdulla

Deşteya sernivîser

Roja 14.06.1957an, li bajarê Helebê, mala birêz Mihemed Elî Xoce, bi proja Apo Osman Sebrî, van her heft camêran (Osman Sebrî, Reşîd Hemo Mihemed Elî Xoce, Şewket Nesan, Xelîl Mihemed Ebdullah, Hemze Niwêran û Abdulhemîd Derwîş) biryara damezrandina

Partiyeke Kurdî li Sûriyê bi navê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê girtine, paşê di sala 1958an de, Dr. Nûredîn Zaza û Cegerxwîn tevli rêxiştinê bûne.

Di pêvajoya xebata siyasî de, evê partiya nûhatî şax û paxên xwe kûr berdane, li hemû deverên Kurdî li Sûriyê qurs daye, belav bûye, gelê Kurd bi şanazî

û dilxweşî pêşwaziya wê kiriye. Herweha, hêjayî gotinê ye ku belge û daxuyaniyên Pratiyê bi zimanê dê bûne.

Li ser deştê dezgehên ewlehiya Sûriyê, xebatkar û rêberên Kurd hatine girtin, bi tundî hatine aşkencekirin, lê her wan li ber xwe dane, bi serbilindî berevanî di ber doza gelê xwe de kirine, û nimûneyên

fidakarî û mêrxasiyê li hemberî sitemkaran gelek in.

Di vê bîranînê de, diyar e ku tevgera me ya siyasî di rewşeke pir xirb de dijî, hêz û partî ji hev dûr in, û ji ber gelek sedeman, ew nikarin di vê qoaxa metirsîdar de deşt bidin hev û yekrêziya tevgerê ragihînin.

Li dema dawî, h e w i l d a n ê n ②

Xebatkarê Kurd Ebdella yê Mele Elî, dirêjtirîn dem di zindanê de borandiye

Deşteya NEWROZê

Bi helkeftina 63yemîn salvegera damezrandina Partiya Kurdî ya pêşîn li Sûriyê, pêwîste em xebatkarên gelê xwe di bîra xwe de bînin, ku bi saya ked û cefakêşiya wan, zimanê me, xwendin û nivîsandina pê hatiye paraştin. Ji wan

xebatkarên, Ebdella yê Mele Elî ku şêwirmendê Komîta Navendî ya Partiyê bû, dirêjtirîn dem (11 Sal û 8 meh) di zindanên rijêma sûriyê de derbas kiriye:

- 1- Sala 1956an.....7 mehan, zindana Qamişlo,
- 2- Sala 1964an.....11 mehan, zindana Helebê.
- 3- Sala 1965an.....8 mehan, zindana Helebê.

4- Sala 19739....1982-Sal, zindanên Heleb, Şam û Heskê.

5- Sala 1995an.....6 mehan, zindana Şamê.

Ebdella yê Mele Elî, 11ê meha Avdara sala 1939an, li gundê Degşûrî-Devera Cizîrê ji dê û bavekî Kurd bûye, navê bav Mele Elî, û dayikê Cemîle . Sala 1959an, lîseyê(Bekeklorya)



deştine, du salan jî mafnasiyê li ①

Helwestên dirust, yên gel in

Nûşîn Bêcirmanî

Di jiyane de, kes , malbat, sazî, partî û saziyên siyasî, civakî, çandî û rewşenbîrî, xwedî armanc û bawerî ne, di heman demê de ew şeweyekî kar jî bikar tînin. Herweha ew hewil didin ku ji bo pêkanîna wan armancan karê xwe xurt û çalak bikin.

Bêguman, her yek ji van çarçewan dixwaze ku bîr û baweriyên xwe bibe serî, li hêla din jî, dixwazin ku yê bi van nerînan berwer bin, pir bibin, da bweriyên wî werin belavkirin û bibin baweriyên jimareke mezin û kesên xwedî asteke bilind di civakê de.

Di beşê siyasî de, nerîn û helwestên siyasî ji partiyekê re di civat, konfrans û kongiran de, piştî danûstandineke azad tê standin û ji bo ew nerîn bibe helwestê civakê. endamên wê partiyê xebatê di ber wan nerîn û helwestan de dikin. Helwest û nerînen

siyasî yên rast û durist, çendî yên li dijî wan hebin jî, lê ew demkî ne, di dawiyê de, çî dûr çî nêzîk, ew ê biserkevin û ji gel re bibin pirogram û rêbaz.

Ev diyardeya jorîn – ku jimareke mezin baweriyê bi helwestên partiyekê binin-gerek cihê şanaziya endam û serkirdeyên wê partiyê be, tevî ku amaje bi wê partiyê neyê kirin, ji ber ku ya girînge ew e ku nerînen wê partiyê tê helwest û nerîn bibin bawerîne giştîyan e, ji ber ew pêwîstîre krvine pratîkê.

Weke mînak li ser vê diyardeyê, nerîn , helwest û şeweyên karê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ) di gelek qonax û helwestan de, eger em tiştan jî binav bikin di bawerîya min de nekêmasiye. Çend nimûne li ser hin helwest û nerînan emê bînin zimên, ji demek nêzîk ne dûr ve, ji sala 2011ê ve, dema kirîza Sûriyê dest pêkir û ta niha .

1 – Di destpêka kirîza Sûriyê de, Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê di belavok û nerînen xwe de diyar dikir ku rijîma Sûriyê zû bi zû naroxe, û çareserîya vê kirîzê gerek bi riya diyalokê be; şoreşa gelê Sûriyê gerek aştiyane be, ne çekdar be, lê ev nerîn ne ciyê rezamendiya gelek hêzên kurdî bû.

2 – Dema biryara Encumena Niştîmanî Kurdî li Sûriyê, ku derbasî hemahengîya Sûrî bibe, Partiya Y.D.K.S.ne bi derbasbûnê re bû, lê ji bo man û paraştina encumenê li dijî wê ranewestîya, û nerîna xwe bi erêbûnê da, lê di belavokên xwe de bielalî helwesta xwe ji gel û raya giştî re diyar kir ...Roj bi roj, helwestên serkirdeyên Hemahengiyê derbarê gelê kurd û pîrsgirêka kurdî di Sûriyê de, xweş diyar bûn ku li dijî mafê gelê kurd bûn û ta îro roj jî ew dijî mafên gelê Kurd in.

3 – P.Y.D.K, didît ku Yekîneyên Paraştina Gel (YPG û YPJ) hêzin Kurdî

ne û yên ji wan di bervaniya di ber gel de jiyana xwe jidest dide, ew pakrewanên miletê kurd in û gerek hêzên kurdî di veşartina wan de beşdar bin û rêzgirtin ji wan û malbatên wan re were girtin.

4 – Di civata fereh de ya ku di 25/2014/12/ê de lidarket, biryar hate standin ku rêvebirîya xweser rêvebirîyeke kurdî ye, destkeftiyên wê ji miletê kurd re qizincin hêja ne, helwestê jê erênî ye, gerek di riya destnîşankirina şaşîyan û bicîkirina xalên erênî de, em wê zengîn û bi pêş de bidin.

Ev xalên li jor û gelek ên din wek wan ji helwestên partiyê bûn, ku necihê erêbûna gelek hêzan bûn, lê bi demê re, ew jî gihane wê baweriyê ku yên rast û durist ev bûn..

Di dawiyê de, dema ku nerîn û baweriyên mirov ewên di rajeya gel û doza wî de ne biserkevin, gereke mirov şanaz be, mirov berketiyê dozê be, ne berketiyê partiya xwe be!

63 sal ... Dûmahîk

Mîna Rojê xuya ye, dema ku hêzên Kurdî nêzîkî hev dibin, yan Kurd hin mafan bidest dixin, hemû neyarên wan guhan bel dikin, şiyar dimînin, ranazên!!, bi hev re, bi hemû şeweyên ragihandinê, dîplomsî û xiniziyê şerê wê nêzîkbûn, lihevkerin û destkeftiyê dikin. Di diyalogên Kurdî yên vê dawiyê de, ev yek aşkere berz û diyar bû...!

Lê, bawerîya me li cihe ku xêrxwaz ji xêrnawazan pirtir in, nîfşê me yê nû, rewşenbîr, bîrewer û kesayetiyên serbixwe, dê dest bidin hev û yekîtiya Kurdan bicih bînin, ne îro be, sibe ye, û ew dê xwestek û hêviyên Ehmedê Xanî, Celadet Bedirxan û Cegerxwîn bicih bînin, mil li mil, dest bi xebateke nûjen û tekûz bikin, ji ber

ku yekîti, destpêka kar û xebatê ye, ne dawîya wê ye. Silav ji giyanê damezrênerên tevgera Kurdî li Sûriyê re, ew ên ku ji bo doza gelê xwe, bi salan di zindanan rijemê de razane, û toşî aşkence û azarên hovane bûne, lê wan zimanê Kurdî û rûmeta me ya netewî paraştine!.

ku yekîti, destpêka kar û xebatê ye, ne dawîya wê ye. Silav ji giyanê damezrênerên tevgera Kurdî li Sûriyê re, ew ên ku ji bo doza gelê xwe, bi salan di zindanan rijemê de razane, û toşî aşkence û azarên hovane bûne, lê wan zimanê Kurdî û rûmeta me ya netewî paraştine!.

Tewanên cengê û yên li dijî mirovatiyê, guhertinên dîmografîk, yên digihin asta qirkirina milî, li Efrînê bikartên

Şukrî Dedo



Li dirêjîya du salan herêma Efrînê (Kurday)- bakur rojavayî Sûriyê bûye devereke ne aram, serberdayetî û zikreşî, bînpêkirin û tewanên cuda hatine bikaranîn; piştî ku aramî û pêşveçûneke baş di çend salan de dîtibû.

Hêrişa artêşa Turkiyê û milîsên Hemahengiya Sûrî-Îxwanî li dijî Efrînê, di despêka sala 2018 an de, tersî mada/51/an ya belgeya Neteweyên Yekbûyî (UN) bû, ji ber ku tu êriş yan gefûgur ji aliyê Efrînê ve tune bûn, û ne jî metirsî li dijî Turkiyê çêdikir. Lewre, dijmindariya Turkiyê li ser Efrînê li gorî sîstema Roma bîngehîn ya dadgeha cîniyeta navdewletî tewan e, û li gorî peymanê «Lahay 1907an» û navnîşanên zagonên navdewletî dagîrkerî ye.

Xişm û bêtar bi ser xelk, kevir û darên Efrînê de hatin; tewanên cengê û yên li dijî mirovatiyê, guhertinên dîmografîk, yên digihin asta qirkirina milî, berdewam li dijî Kurdayan dihatin bikaranîn.

- **Kuştina kîndar û komkujiyên sivîlan:** Di dema hêrişê de kumkujî di (Tîmargeha mirîşkan ya Robariya, Mabeta, Kobelê, Basûtê, Hêkicê, xestexana Avrîn, Berbenê, Cindirêse,

Firîrê, taxa Mehmodiyê, Yalanqozê...) de çêbûn, û kewranên piştgiriyê yên sivîlan hatin aramanckirin; lewre, hejmara şehîdên sivîl gihîştê /300/î, bi dehan ji wan zarok û jin bûn, û bêtirî /1000/î birîndarbûn, û ji roja dagîrkiriyê, 18 Avdara 2018an de, heya nuha nêzî /130/ kesî hatine kuştin, ji bilî mirinên di bin zordarî û zehmetiyan de.

- **Perîşantî û Koletîkirina sivîlan:** Piraniya deriyên kar li pêş xelkê Efrînê hatin girtin, mal û mewalên wan hatin talakirin, jêderên pêdiviyên jiyanê miçiqîn, çiyên zeytûn û çandiniyê, dewêyêr û mirîşkan, yan pîşesazî û bazirganiyê; nimûne, girtina dora /800/ kargehên dirûna cil û bergan; bi ser de jî, koletîkirina hin xelkê ji aliyê serekên milîsan di karan de.

- **Dûrxistina nişteciyên resen û guhartina dîmografîk:** Di bin derbeyên cengê de bêtirî /250/ hezarî ji nişteciyên resen, bi zorê penaberbûn, û vegera dora /200/ hezarî ji wan qedexe bû, ji aliyê artêşa Turkiyê û milîsan ve; û heya nuha bi

sed hezaran ji xelkê Gota-Şam, gundewarê «Himis, Hema, Idlib û Helebê» anîn û li Efrînê cîbicîkirin, di cîwar, mal û mewalên Kurdayan de, yên ku hebûna wan ji 95% daketî kêmîtirî 20% an, û rojane zordarî li wan dibe, da ku hin din xaka xwe berdin û koçber bibin.

- **Îşkenceyî û îhaneta mirovan:** Rojane xelkê Efrînê raştî îhanet û nerindiyan tên, pir kes hatine û tene binçavkirin yan revandin, di nav de êrgan, jin û kalmêr hene, ew hemî tene îşkencekirin, û pereyên pir ji xwedîya tene şandin; û çarenûsa bêtirî /1100/î ne diyare.

- **Zordariya rewşenbîrî û netewî:** Li ser bîngeha nêrînên nijadperestî û şovenî pirî caran berpirsên Turkiyê û milîsên cîhadîst gotine: Kurd kafir, kêmdîn û îman, cudaxwez û têrorin! Fetweyên talana arziyên wan derxistine! Lewre, zordariyeke rewşenbîrî û netewî li ser Kurdayan tê meşandin, ji dijîtiya çand û zimanê Kurdî, guhertina navên hin gund û bajarokan, qedexekirina cejina Newrozê, hilweşandina pûteyê Kawayê Hesinkar... heya dana «Nasnameyên Kesayetî» yên bi zimanê Turkî û Erebî, yên ku hemî, nişteciyên resen û yên hatine cîbicîkirin weke hev dikin, li beram

berî belavkirina çandêke Osmanî nû, di riya komele, dibistanên Îmam El-Xetîb, çalakiyên xortan, korsên zarokan û hildana Ala Turkî re, mebest jê ewe ku xelkê bikin Turkcî.

- **Zordariya olî:** Kurdên Êzdî koçberbûn û hin ji wan hatin îşkencekirin û kuştin, û yên li herêma mane nema dikarin weke berê oltiya xwe aşkere bikin û neji bi cejinên xwe şabibin, lewre, pir mezarên wan hatin xerakirin û dizîn. Hinde Xirîstiyên ku hene newêrin ola xwe diyar bikin, û Kinîseya tek li bajarê Efrînê hate dizîn û girtin li ser destên milîsan. Û tiştên pir Mizgeftan (Fereyên baqirî, Sicade, Amûrên deng, Tablo û beteriyan êlikriîkê) hatin dizîn, ji bilî bombebarakirin û xerakirina hin Mizgeft û pir mezarên Îslamî. Ji alîkî din ve, di riya komele, Îmam El-Xetîb û dibistanên olî, çandêke olî Osmaî û tundrew tê belavkirin.

- **Armanckirina mal, cîgehên taybet û gelemper, û destserdana arziyan:** Bi derbên giran û bombebarankirina gund û navçeyên Efrînê, pir mal û cîgehên taybet û gelemper xerabûn yan hilweşîn (Dibistan, Mizgeft û Mezar, Nexweşxana Avrîn, Navendên bijîjkiyê, Nanpêjgehan, Cîgehên ava vexwerinê) ④



Tewanên ... Dûmahîk

Pakrewanên Kurd yê Teqîna Efrînê, roja 28.04.2020an

û yên avdana çandiniyê, Serjêgeha pêz, Tîmargeha mirîşkan, Guvêşgehên Zeytûnan, Cîgehên rêvebiriye...), û ji roja yekem ve milîsan dest bi dizîna hemî tiştan kirin (Xwerin û Vexwerin, Amûr û Alav, Makîne, hin Guvêşgeh û Kargeh, Dewar û Mirîşk, Baqir û Tiştên malan, Alav û Beteriyên êliktrîkê, Berhemên zeytûna, Fêkî û Tene...), lewre, roja 18 Avdara 2018an, bi «Roja hêrişa Kuliyan» hate nasîn, ji ber ku piraniya tiştê bajarê Efrînê di wê rojê de hate dizîn, ji aliyê milîsan ve. Ji bilî destserdana nêzî nivî mal û milkên xelkê, û tevahiya hin gundan (Qestel Cindo, Baflûn, Sînka û Berava- navça Şera, Cilbir, Kobelê, Dêrmişmiş, Zirêkat, Basilê û Xalta- navça Robariya, Çiyê û Dêwrîş- navça Reco, Şêxorz û Qota- navça Bilbilê, Tillif...) û qedexekirina vegera xelkê wan, ji ber ku kirine cîgehên leşkerî.

- **Revandin,** **Binçavkirinên setem û tewşankî:** Bi dehan Kurdên sivîl hatin revandin ji aliyê milîsan ve, hin ji wan hatin kuştin û hin wendane, û

xwediye yê berdayî peren pir dan. Artêşa Turkiyê xuyanekir ku çend dîlên Kurd li cem hene; lewre, bêtirî /1100/î ji girtiyên bi tundî veşartî, çarenûsa wan ne diyare, û hinên hatine berdan çêrokên hovane li ser îşkenceyîyê hewaldidin. Binçavkirinên setem û tewşankî di bin çavdêriya Îstîxbarata Turkî de li herêma Efrînê berdewame, bê sûc û gunê, ji bilî «têklî bi Rêvebiriya Xweser ya berê re», ewjî li gorî zagona mirovahî ya navdewletî (mada /70/ ji peymanê Cinêv ya çaran 1949an), çê nabe tu kes li ser helwest û têkliyên xwe yê berî dagîrkeriyê tewanbar be. Li beramber girtinan, mal û mobayl tene sekirin, û girtî li pêş xwediyan tene lêdan, hin ji wan jî êrgan, jin û kalmêrin, hin bêtirî carekê hatine girtin, û ji hemiyên pere tene standin, da ku piştî zîndankirinê, li cem «dadgeha destladerên dagîrker» werin berdan, ya ku bingeheke danasîne li ser wan çêdike û dide Îstîxbarata Turkiyê.

- **Zirar bi Xwezayê:** Nêzî /15/ hezar Hêktar ji tevahiya /32/ hezar Hêktar li Efrînê, di çiyayên (Robariya, Şêrewa, Şera,

Bilbilê, Reco, Mabetê, Şiyê, Cindirêsê, Mehmodiyê) de, ji dar û kelemên Îhracê, û bi sed hezaran darên zeytûnê, hatine qutkirin yan şewitandin, bona çêkirina cîgehên leşkerî yan ji bo Êzinga û Komirê.

- **Hilweşandina Mezel û Şûnwarên dîrokî:** Bi bomban û amûrên giran mezelen Şehîdan li (Kefirsefrê, Metîna, Kefersîlê) hatin hilweşandin, û hin tîrbeyên kesayetiyên bi nav û deng, yan hine bi Kurdî li ser nivîsandî, hatin xerakirin, weke ya nemir Nûrî Dêrsimî û ya şehîd Kemal Henan. Û pir Şûnwarên dîrokî (Êndarê, Nebî Horî, Teqilkê, Berad), Tilên (Birc Ebdelo, Qîbarê, Cindirêsê, Gemrûkê, Sêmalka, Ziravkê, Kitix, Dirûmê, Dudêra Meydankê, Merwaniyê jêrîn, Cîrnazê, Bazariyê, Xirabê Elo, Kûra, Bilêlko...) hatin kolan û tiştên nirxbuha jê hatin dizîn, bi ferman û çavdêriya Îstîxbarata Turkiyê, piştî ku hin şûnwar di rojên cengê de hatibûn bombebarankirin.

- **Îxtîsab û zewacane bi dilraziyê:** Hin nûçe hene ku, Îxtîsab û zewacane bi dilraziyê dermafê hin

jin û keçan, ji aliyê milîsan ve çêdibin, lê piraniya wan û xwediyan naxwezî aşkere bikin.

- **Penaberên Efrînê:** Ji bilî yê ku, berî sala 2018an koçberbûne, bêtirî /200/ hezar ji xelkê Efrînê penaberbûn, jê /85/ hezar heya nuha li gundewarên Şêrewa û Şehbayê - bakurî Helebê dimînin, jiyaneke kambax derbasdikin; dora /9/ hezaran ji wan di kampên çadîran de dijîn, û pirî caran hêzên artêşa Turk û milîsan wan gundan armancdikin, û xelkê sivîl şehîd dibin, weke kumkujiya bajarokê Tilrifet, di roja 02.12.2019an de.

- **Lawaziya xizmetguzarî û avahiyên bîngêhîn:** Avahî, alav û cîgehên ava vexwerinê, êliktrîk, telefon, nexweşxane, dibistan, enûstut û zanîngeh... HWD hatin dizîn û xerakirin, û xizmetguzariya wan pir lawaz bûne.

- **Dîwarê cudawaziyê:** Artêşa Turkiyê dîwarekî ji çimentuya hesînî bi bilîndiya /2/ m li derdora cîgeh û bînesaziyên ewlekar û leşkerî, û li pêş gundên (Kîmarê, Mêriyemînê, Cilbirê)- Çiyayê Lêlûn g i r t i y e ; 5

Sembola hebûna gel... Ziman e

Nazdar Hesên

Ji ber ku ziman ji gelên bindest re ne tenê alava derbirin, têgihîştin, veguhestin û belavkirina zanîne ye, lê belê, ew nasname û sembola hebûna netewa wî ye, û di bin sîwanê wê de, hemû hêmanên taybetmendiya wî gelî ji çand, wêje, huner, kelepûr û şarîstaniyê diparêze û dinasîne, û ev jî tê wateya ku ziman, gel ji windabûn û piştaftinê diparêze, lewre li ba wan gelan paraştina zimên giringtir û pêwîstir e, ji ber vê yekê jî diviya bû bêtir ew di warê zimên de bixebitin, ta li ser zemînê bimînin û hebûna xwe tekez bikin.

Bêguman, gelê me yê kurd yek ji wan gelan e

Şêrîn û xweşe

ZIMANÊ KURDÎ



yên ku tevî bindestiya bi sed salan û qedexekirina zimanê wî û jiyana wan di mercên kirêt û dijwar de ye, hebûna xwe tekez kirin û zimanê xwe paraştin. Helbet ev bi saya xebata gelek zana û xebatkarên zimên de ye, yên ku barê fêrkirin û paraştina zimên li ser milên xwe girtibûn û di hiş û jiyana milletê xwe de guhertinek kûr û sûdar xêz kiribûn, û ji wan hîmdarên zimên ên herî sereke Mîr Miqdad Midhet Bedirxan e yê ku di roja 22ê Nîsana sala

1898an yekemîn rojnameya Kurdî bi navê Kurdistan bi tîpên erebî li paytexta Misrê Qahîrê derxişt û ew roj ji milletê me re bûye roja rojnamegeriya kurdî, pişt re Mîr Celadet Bedirxan bi keda xwe ya giranbûha ziman dewlemendtir kir, bingeharê zimanê kurdî danî û yekemîn alfabeya kurdî bi tîpên latînî ava kir û di 15ê Gulana sala 1932an de Kovara « Hawarê » weşand û ji ber giringiya wê, ew roj bûye roja zimanê Kurdî.

Ji wê demê û vir de,

gelek weşanên giranbûha tene weşandin, yek ji wan weşanan Rojnameya Newroz e, ya ku di hejmarên xwe ya 144an de 25 sal li ser weşana wê re derbas dibe û ew berdewam e, bi gotar û nêrînen xwe bandoreke erênî li çand û zimên dibe û ji bo paraştina mafên xwe ên netewî dixebite û berdewamiya weşanên wiha ji gel û zimên re destkeftinên mezin in.

Belê, giringiya zimên û paraştina wî, ne kêmî hezkirina welêt û paraştina wî ye, û ger em ji welatê xwe hez nekin em ji zimanê xwe jî hez nakin, ji ber wê jî, pêwîst e em xemxwerê zimanê xwe bin, wî baş nas bikin û bidin nasîn, em xwedî lê der kevin û wî pirtir bi rêk û pêk bikin.

Tewanên ... Dûmahîk

pêngaveke bi guman e di projeya avakirina dîwarekî cudawaziyê de ku, Efrînê ji bakurî Helebê biqetîne.

- **Ne aramî, Serbedayetî û guhnedana giliyên nişteciyên resen:** Hikometa Anqerê bi zanebûn rewşa herêmê di serbedayetiye dihêle, û ew encûmenên xwecihî ku çêkirine wek destik di pîlanên xwe de bi kar tîne; destên milîsan berdane ku, her giropek bi kêfa xwe bi xelkê re bide biştîne, setem û zordariyê li ser wan bi meşîne; bînpê û tewan dermafê Kurdan bê ceza

û dadmendî derbas dibin, yên gunehkar ji cezayan difiltin, û giliyên nişteciyên resen li cem destlatên heyî, berpirsên Turk û milîsan red dibin, bê guhdan û lêkolîn derbas dibin, bi ser de carna xwediyê giliyan îhanet dibin. Ji alikî din ve, ew giropên milîsan yên çete xwe bi xwe lihev dixin, ji nav wan birîndar û kuştî dikevin; û herdemekê otombîl û avêjtok li Efrînê diteqin, dibin sedema ziyanên mezin, û birîndariya û têkçûna jiyan sivilan; heyameke bi tirs û hovane heye, ji ber wê piraniya xelkê newêrin li

ser bînpêkirin û tewanên bipeyvin û daxuyankin.

Ji ber ku, Turkiyê bi darê zorê û hêzên xwe yên leşkerî serdesta parekî ji xaka dewletek din dibe (Efrîna Sûryê), ev prose dagîrkerî ye, lê ew xwe weha na de pêş, zagona mirovahî ya navdewletî, û biryara Encûmena Ewlehî ya navdewletî /2254-2015an/ jî bînpêdike; herêma Efrînê dorpeçkeriyê û li pêş ragihandinê, şandên perlemanî, rêxistinên sivil û mafdariyê, girtî ye û perdeyeke reş bi serde berdaye, dixweze civaka Kurdî ji kokê de bihejîne.

Kurdên Sûriyê, bira û dostên wan, xebata xwe berdewamdikin; pîlanên Turkiyê yên nijadperest û şoven, bînpêkirin û tewanên guhertinên dîmografî yên ku, li dijî Kurdan dihêne kirin, aşkere û rûreşdikin; ta bigihên asta bi dawîkirina dagîrkeriyê û dawîbûna rêxistin û milîsên cîhadîst yên tundrew.



Şam şekir e... Welat şêrîntir e

Newafê Bişar



Li cîhanê, gelê Kurd bi du taybetmendiyên navdar e. Yek jê mêrxasî û ya din jî girêdana wî bi xaka bav û bapîrên wî re ye. Ji ber vê hindê, wî çendî sitem û zordarî li ser destê neyarên xwe yên bê ol kişandî ye jî, lê, qet wî xaka xwe, ango welatê xwe Kurdiştan bernedaye û koçber nebûye!..


Ji xwendina rûpelên dîrokê bi zelalî tê zanîn ku, çendî neyarên vî gelî hewil dane, pilanên gemar ên ne mirovane ji bo valakirina welatê wî hûnane jî, lê ew pilan têkçûne. Ji bo man û hebûna xwe, gelê Kurd pêdarî û berxwedaneke bê hempa kiriye, û ew ji holê ranebûye.

Çendî vî gelî kuştar û kexxên hovane yên mîna Dêrsim, Aleqemş û Helebçeyê...û hwd dîtine, gund û bajarên wî hatine şewitandin jî, lê, dîsa wî welatê xwe bernedaye û taromar nebûye. Yekcaran, ji ber serhildan û têkoşînê hin xebatkarên gelê Kurd jî bin darê zorê ji welatê hatine bidûrxistin û sergonkirin, lê, wan dil, hiş û giyanên xwe li welatê hiştine, bêriya dar, çiya, dehl û zozanên xwe

kirine!! Sed mixabin, tiştê îro mirov seyr dihêle ew e ku Kurdên Sûriyê xwe li ber vê pêla demkî û awarte ne girtine, bi dehê hizaran mirov gund û bajarên xwe hiştine li dinyayê tert û bela bûne, hin li dewletên sînordar û hin li dewletên Ewropayê cîwar bûne.

Bêgoman e ku rewşa aborî li welatê me Sûriyê kambax bûye, bê karî, perşanî û hejarî pir bûye, gerdûn li serê me hemiyan teng bûye...Lê, piraniya derketiyan karîbûn debara xwe bikin û welatê xwe bernedin. Mixabin ku cihê xemgîniyê ye îro li bajarekî mîna Qamişlo rêjeya Kurdan tê de hindik bûye, eger rewş bi vî hawî derbas bibe, nêzik dê Kurd di bajarên xwe de hindikayî bêne jimartin!!

Li dawiyê, ez dixwazim pexşaneyê têkoşer û rewşenbîrê Kurd ê navdar Dr.Nûredîn Zaza ya ku bi sernava «Derketî» ya di Kovara HAWARê de-hejmar(27)- Hizêran 1941 de hatibû weşandin, pêşkêşî we bikim, da ku em hemî tehliya derbederiyê nas bikin û jê hîn evîna welatê xwe bibin:



«DERKETÎ»

Terka welatê xwe da û kete dinyayê.

Xwedê rêberiya

derketiyan bike!
Ez di nav miletan re derbas bûm,
li min nêrîn, min li wan nihêrt;
lê me hevdû nas ne kirin.
Derketî li her derê bi tenê ye!

Gava roj diçû ava û ji xircikên newalan dû û dûman radibûn;
min ji xwe re digot:
«Çiqas bextiyar e ew mirovê ko êvaran vedigere mala xwe û di nav zar û zêçên xwe de rûdine».
Derketî li her derê bi tenê ye!

Bi kû da diçin ew ewrên ko ba wan dide ber xwe?
Ba, min jî wek wan dide ber xwe û bê hemdê min, bi kêfa xwe min dajo.
Derketî li her derê bi tenê ye!


Ev dar spehî, ev kulîlk xweşik in;
lê ev ne dar û kulîlkên welatê min in: Tu tiştî nabêjin min.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Ev çem bi dilekî şikestî li deştê diherike;
lê xurîna wî, ne wek ya çemê me ye ko min di zarotiya xwe de dibihîstî; ev tu tiştî nayine bîra min.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Ev stran şîrîn in; lê ahengên wan ên geş û



zîz ne wek yên stranên welatê min in.
Derketî li her derê bi tenê ye!

Ji min pirsîn; «Çima hergav bi girîn î?»
Gava min sebeb gote wan;
tu kes bi min re ne girî; ji ber ko derdê min fehim ne kirin.
Derketî li her derê bi tenê ye!

Min kalin dîtin; zaro li wan hêwirîne,
mîna zeytûnên kevnare ko kelem û derxik li wan hatine hev.

Lê tiwan ne gote min, «kurê min!» tu zarokî ne gote min «bavo!»
Derketî li her derê bi tenê ye!

Min di ser kelat û bircan re alin dîtin;
lê ne bi reng, ne jî bi pêldana wan,
dilê min geş ne bû; ew ne keskesorên me bûn.
Derketî li her derê bi tenê ye!

Heval,
bav û bira, xweşik, rehetî û serbilindî,
bi tenê li welatê hene.
Derketî li her derê bi tenê ye!...

Çima nivîskarê Kurd bi Kurdî nanivîsîne?

Cansoz Dabo

Li Rojavayê Kurdiştanê û Sûriyê, ji ber rewşa ku Kurd tê re derbas bûne û qedexeya zimanê Kurdî ji aliyê desthilatên Şamê yê nîjadperest û şovenîzm, xelk neçar diman, zarokên xwe dişandine dibistanên Erebi. Vê rewşê hîşt ku piraniya nivîskarên Kurd ji her du zayendan, berhemên xwe bi zimanê Erebi binivîsînin û zimanê xwe yê zikmakî piştguh bikin. Gelek ji wan navdar bûn û bêyî ku berhemekê jî bi zimanê xwe biafirînin. Her çendî rewşa herêmên Kurdî ji sala 2011an ve, ji dema ku kirîza Sûriyê dest pê kirî de, hatiye guhertin. Ji aliyekî ve zimanê dibistanan bi Kurdî ye û ji aliyê din ve ew kesên ku berê li dibistanên Erebi xwendibûn, ji nû ve li waneyên zimên beşdar bûn û xwe hînî Kurdî kirin. Lê hîn jî rêjeyeke mezin

ji nivîskaran bi rijd in ku bi zimanê Erebi biafirînin. Sedema vê yekê li gor şopandina me ew e, ku her aliyek aliyê din gunehkar dike, ango nivîskar dibêjin: Xwendevanên Kurdî kêma in û ewên ku hene jî piraniya wan bi Erebi dixwînin, xwendevan jî nivîskaran tewanbar dikin û dibêjin: Ev kêmahiya wan e û wan xwendevanên xwe hînî xwendina bi zimanê Erebi kirine.

Di vê derbarê de, min rapirsînek li ser tora civakî, gurûpa bi navê «Kurdên Zanîngeha Helebê» ku hejmara wan bêhtirî pênc hezar kes e, ew hemû xwendekar û derçûyên wê zanîngehê ne û beşên curbicur xwendine. Paşê min ew li ser rûpela xwe ya kesane jî weşand. Tevahiya kesên dengê xwe dane 207 kes bûn, ji wan _Kurdî: 57 kes. _Erebi: 39 kes. _Kurdî û Erebi: 109 kes. Du «2» kesan jî

lome kirin û gotin em Kurd yekcar naxwînin, ango bi tu zimanan naxwînin. Beşekî ji wan nêrînen xwe dan û gotin: Xwendina bi zimanê Kurdî xweş û hêsan e û em tu astengiyan tê de nabînin. Beşê din, ew yê mezin bû, got: Xwendina bi zimanê Kurdî ne hêsan e û carina em di têgihîştina hin terman de zehmetiyan dibînin, ji ber ku me ji biçûkî ve li dibistanên Erebi dixwend û çanda me bi wî zimanî ye.

Li gor dengdanan, 57 kes berê bi Kurdî dixwînin û 109ê din jî, ew kesên ku bi her du zimanan, Erebi û Kurdî dixwînin, ew jî bi Kurdî dixwînin. Bi vî awayî 166 kes ji her du zayendan bi Kurdî dixwînin, ji tevahiya kesên ku dengê xwe dane, ew jî 207 bûn, ji bilî her du kesên ku gotin, Kurd naxwînin, dixwînin. Li gor vê lêpîrsînê, diyar dibe ku nivîskaran hewl nedane bi Kurdî binivîsînin û xwendevanên xwe hînî



xwendina bi Erebi kirin. Bi nêrîna min, divê ji ber du sedeman nivîskar girîngiyê bidine zimanê xwe û hinekî xwe pê mijûl bikin. Yek jê, kesên ku berê bi Kurdî nedixwend, di van çend salên dawiyê de xwe li pêş xist û êdî pê dixwînin. Sedema din ya sereke jî ew e, nîfşê nû li herêmên Kurdî tenê bi Kurdî dixwîne û peywendiyên civakî yê rojane jî wek berê di navbera pêkhatên Sûriyê de kêma bûne. Ji xwe berê piraniya herêmên Kurdî sade Kurd in. Lewre jî dibe ku di çend salên bînan de, wek herêma Kurdiştana Îraqê, pir kes ji bilî berhemên Kurdî ne bixwînin û ne jî guhdanê pê bikin.

Bapîrê min

Janko Glazer*



Ji Îngilîzî: **Husên M. Hebeş (Hussein Habasch)**

Bapîrê min hesinkar bû,
pêncî salî hesinkar bû
pêncî salî li ber agir bû
pêncî salî li hesin dixist.
Av diherikî, serkêşiya aş
dikir
Roj bi roj, brûsk
hildiweşîn
û ji berî ku rojek nû ji
berbangê bipişkive,
bi çakûçekî giran hesin
durist dikir.
Reş û şewitî li pêşiya
agir bû,
bi destekî hêz qedera

xwe çêdikir.
Bapîrê min hesinkar bû,
pêncî salî hesinkar bû!
2
Ew niha westiyayî û
bêhnvedanek dike,
lê guhê wî herdem li
binî ye,
hîn dixweze li dengê
çakûçekan guhdar bike.
Bê westandin li sindan
tê xistin
tenê ji dûr ve dengê
bihêz û kûr tê
divê ku dengê naskirî

careke din hêztir bibe
û wî hişyar bike
û careke din berbang û
rojên berê vegeirîne.
Ew fêr bûbû di nivê agir
de raweste
û qedera xwe bi destên
xwe yê germ çêbike.
Bapîrê min hesinkar bû,
pêncî salî hesinkar bû!
3
Lê belê dîsa jî erd heye,
lê şop tune ye
ji jiyane, ji berbangê û ji
rojê 8

Gulistan Awaz

*Nav: Berêz Gulistan Awaz ji gundê (Ebo Ke'ibê) navçeya Cindirêsê - Efrîn

*Li sala 1982an, li Helebê - Sûriyê ji dayîk bûye .

*Çar zarokên xwe hene û hemû lawik in.

*Li sala 2008an, bi tirs û bi dizî di hundir malan de li Helebê di Saziya Fêrkirin û Paraştina Zimanê Kurdî de deşt bi fêrbûna zimanê kurdî kir.

*Li sala 2013an, piştî ku wê aştî siyemîn a rêzimana Kurdî bi pileya baştirîn di Saziya Fêrkirin û Paraştina Zimanê Kurdî de li Sûriyê qedand û ji ber rewşa xirab li Helebê ew li gundê Celemê, Cindirêsê-gundê hevjinê wê (Baranê Çûmê)-bi cih bû û wê deşt bi fêrkirina zimanê Kurdî di mala /Zanîn/de li gundê Celemê kir, bi dehan xort û keç, biçûk û mezin fêrnameya zimanê kurdî wergirtin.

* Ji sala 2012an, Gulistan Awaz deşt bi nivîsandina Kurdî kiriye.

*Carina wê hin gotaran jî dinivîsîne .

*Yekemcar dema ew

hînî zimanê kurdî dibû, pirpegandek(دعایه) bi Kurdî bi navê(Pêpsiyan Hertim Vexwin) nivîsand û di rojnama NEWROZê ya hejmar(96)an de sala 2011an hate weşandin.

*Ji sala (2017)an, li gel malbata xwe li Almanyayê li bajarê Bremen, bi cih bûye .

*Carina pêşkêşvaniya aheng û cejnan jî dike wek(Cejna Newrozê).

*Carina lêvegerên vekîti û zimanî ji pirtûkên kurdî re dike û yekemcar li deştpeka sala 2017an, wê lêvegereke vekîti li gel çend mamosteyan ji pirtûka (KELÎLE Û DÎMNE) ya ku Dr. Mihemed Ebdo Elî ji erebî wergerandibû kurdî kir, pişt re wê lêvegereke ji pirtûka mamoste Birahîm Mela Qasim a bi navê (CIWANKARIYA HELBESTA KURDÎ « Lêkolîn « kir û niha pirtûkeke din a mamoste Birahîm Mela Qasim di nav deştên wê de ye û ew lêvegerê jê re dike.

*Li bajarê ku ew lê dimîne di Komela Civaka Kurdî ji bo Perwerde

û Hînkariyê-Hînkari Bremen- de cîgira serokê komelê ye.

*Gulistan Awaz niha waneyên fêrkirina zimanê kurdî (online) dide bi rêya Internête .

*Piştî ku nexweşiya Korona li cîhanê belav bû, wê derfeteke ji zêr dît ku ew li helbestên xwe vegere û ji weşanxaneyê re bişîne . Ew ghişte armanca xwe û pirtûka wê a yekê ya helbestên nûjen, li 17.06.2020an, ji weşanxaneya SerSera li Almanyayê ghişte ber deştên wê .

* Pirtûk bi navê BUXÇIKA BIYANIYÊ ye.

* Ji 108 rûpelan pêk tê. *Hejmara helbestan 51 in.

* Pêşgotin a mamoste Merwan Berekat e.

*Wênayê bergê û wênayên ku di nav rûpelên pirtûkê de, ji berhemên şewekar û mamosteyê efrînî Aslan Memo ne.

* Naveroka helbestan li ser êşên penaberî, biyanî û bidûrketina ji hemêza welêt e, qêrîn û hawara Efrîna kezebşewitî ye û kêman deriyê evînê jî dipelîne.



Ev e yek ji helbestên wê ne (ji rûpela 25 an):

TILIYÊN BERJEWENDIYÊ

Vê şevê,
Axîna rojêke dilşikestî,
Guhên tariyê tîk dike.
Keserên ku,
Bi nalîna biyaniyê êşdar bûne.

Li nava demê nenî
dikin Hawara,
çiyayê Kurmênc,
Birîna nederûtî,
Di berîka ezmên de,
Serûbinî hev dibe,
Ji nav tiliyên
berjewendiyê,
Nema çare serbest
bibe?! ..

Giliyên dayîkan,
Xwîna zarokan,
Nalînên gorîstanan,
Li ber deriyên Xwedê,
Sêwî ne..
Sêwî û ji dadmendiye
bêpar in,
Raştî ...
Ji gewriya derewê,
Nema serbest bibe?!

Bapîrê min ... Dûmahîk

strana gurmîna
çakûçekan bihurî ye,
alava ku carna ronahiyê
dida vemirî ye.
Ew niha li derdora agirê
jiyana me ye,
bi deştê ciwanî şansa

me çêdike.
Niha em guhdarî strana
berê dikin,
strana ku dengê wê ji
ser pêlên jiyanê dihat,
lê tarî jî ji jor ve hêdî
hêdî dihat
Çakûçekî giran, Gurm,

gurm...!
Di demeke nêzik de, ew
hesinkar dê me bike toz.
Lê belê dema
hesinkariyê herdem
balkêş e.
Bapîrê min hesinkar bû,
pêncî salî hesinkar bû!

* **Janko Glazer kî ye?**
Ew Helbestvankî ji
Slovenia ye, di roja 21ê
Adarê 1893 li bajarê
Ruše ji dayik bûye û di
roja 2ê Sibatê 1975 li
bajarê xwe Ruše jiyana
xwe ji deşt daye.

Yekirina zimanê Kurdî... Yekirina gel û welêt e

Memê Alan

Gelî xwendevan,
Zimanhez,
zimanzan, rewşenbîr,
siyasetmedar û navendên
biryardana kurdî û
Kurdîstanî...!

Weke em tev dizanin ku, dijminên gel û welatê me yên dîrokî, ji roja roj de bi her awî hewildane û welat û gelê me kirine çar perçe, û hîn jî di hewildanên xwe de berdewam in, da ku, hîn bêtir me perçe - perçe, lawaz û qir bikin, û me di çarçewa netewên xwe de bipişêfin û tune bikin. Em Kurd jî, ji aliyê xwe ve (keç, xort, mêr û jin) berevaniyeke bêhempa li hember wan hewildanên dijminan me kirî û em dikin, da ku, nehêlibin aramancên wan bi cih werin, û herweha yekrêzî û yekîtiya xwe pêk wînin, da ku, mafên xwe yên rewa bi dest bixînin. Lê, em zanin jî ku, yek ji stûn, emraz û mercên sereke ji yekirin û hevgirêdana gel û welatê me re, yekirina zimanê me ye. Yekirina zimanan û yek jê jî yekirina zimanê me yê Kurdî li ser sê bingeh û stûnan tê avakirin. 1- Yekirina alfebeyê (abeyê). 2- Derhênandina Ferhengeke giştî ji zaravên kurdî (Kurmançî, Soranî, Zazakî, Dumilî...H.W.D) re. 3- Avakirina Yekrêziman ji zimanê dê re. Di vê rewşa ne li hev û kambax de ku gel û welatê me tê re derbas dibe. Ji alîkê ve,



dabeşkirina gelê me yê Kurd û Kurdîstanê li ser çar perçan di nav çar dewletan (Turkiyê, Îran, Îraq û Sûriyê) de, teybetiyên rewşa siyasî, civakî, çandî û aborî ya her beşekî, û berjewendî û têkeliyên curbecur ên wan dewletan bi cîhanê û bi hev re, herweha jî, lihevkirina wan a li ser me, ya ji bo tunekirin û pişaftina me û zimanê me. Û ji alîkê din ve nakokiyên aliyên kurdî xwebixwe bi hev re, di pir waran de, geşbûna zarav û devokan li ser hesabê zimanê stander, bikaranîna gelek alfebeyan (Latînî, Erebi, Kilîrî...û H.W.D), tunebûna yekrêziman û yekferhenga giştîyane ku, hemî got û bêjeyên zaraveyî di hundir xwe de kom bike. Lê, li rex wan zehmetî û aloziyên me li jor anîne zimên û yên dibin kend li pêş yekirina zimên, gelek erênî û emraz û faktorên rêdûzkirin, hêsankirin û alîkarbûnê jî hene, ew jî ev in: 1- Hebûna gelek zimazanên zimanê Kurdî yên dilsoz û ji hemî zaravan û gelek saziyên zimên. 2- Serdema em tê de dijîn, serdema şoreşa teknîkî û toreyên hevgirêdana

civakî yên pir pêşketî ye, ya ku, mirovan li Rojava, Rojhilat, Başûr û Bakurê dinyayê bi hêsaniyê digihîne hev û bi hev ve girêdide, yanê cîhan kirine gundekî biçûk û mirov li kû dibin bila bin, kanin - bê ku tengasiyan bibînin - xwe bigihînin hev û kar û barên xwe biqedînin û cîbcî bikin. 3- Hebûna navendên me yên siyasî yên kurdî (Herêma Kurdîstanê û Rêvebiriya Xweser a Demokrat). 4- Peydabûna pêdiviyên kar û barên cîbicîkirina vê piroseyê. 5- Hêsanbûna gera di nav civakê de, ji bo guhdariya li zarav û devokên xwecehî û herêmî, û komkirina bêje û tîrmên bi kar tên. 6- Hêsanbûna peydabûn û bideştixistina jêderên gerek, çi pirtûkên rêzmên ên zaravên kurdî dibin, an jî ferheng dibin. 7- Peydabûna pêzanên zimanên biyanî (bi taybetî zimanên Latînî) yên Kurd. Vêca, pîrsa mezin ew e, ma di siya vê rewş û heyama heyî de, emê kanibin zimanekî stander ava bikin û damezrînin? Bi dîtina me, li rex wan xalên erênî yên ku, me li jor anîne zimên, ger bîr û bocûn vîna me yên

yekirina zimên li cî bin, û viyana siyasî li ba navendên biryardana kurdî (herêma Kurdîstanê û Rêvebiriya Xweser) hebe û bixwezibin hevgirêdanê di nav gelê me de û di her çar perçên Kurdîstanê de xurt bikin, berevaniya me li hember hewildanên dijminan ên pişaftin û qirkirinê pihêt û bi hêztir bikin; Emê kanibin piroseya yekirina zimanê zikmakî cîbecî bikin û bibin serî. Vêca, bangewaziya me ji hemî dilhezên yekirina zimên, gel û welatê me re, yên ku, me li jor bi navkirine û xwe di ber vê dozê de berpirsiyar dibînin (bi taybetî jî H.K û R.X) re hene ku, îro berî siba biryara yekirina zimên biştînin, û kanî û taqetên hene top ser hev bikin, û dest bi gavên piraktîkî bikin, da ku, vê piroseyê di pêşerojê nêzîk de, bi dawî bikin. Û ji wan re dibêjin: Bawer bikin, ger em vê piroseya pîroz bi serî bikin; Pirpirsgirêkên jihev cudakirinê di nav me de, wê çareser bibin, em û zimanê me wê di çavên cîhanê de wê werin berz kirin, û dijminên me yên dîrokî jî, wê qels bikevin.

Dumahîka gotara

Dîroka Hin Bêjeyan**Mihemed Qere Hesên****Peydabûna hunerê****Derketina (ter, teryog, Qeşmer)**

Navêkirina lîstokvan ji navê pîrê Kurdê yezîdî **tereyok** hatiye, ewênê ku di boneyên olî beniyên royê de dikirin. Wek C.C.Firêzer dibêje: Postê binznê li kalekî dikirin, û zengil dikirin uştîyê wî. Ew di dor kesên li wir kom bûne re bi çarlepan dimeşî û zevî kar û berxikan dikir (me>i, me>i). Ev şanoya ji kesên kom bûn re ye, û bi gera di dor wan re sêncek veşartî çêkiriye, ku dijmin nikane wê derbas bike.

Ew karê ku kincên ji çermê bizinê li **teriyog** kirine, gava yekê bû di dîrokê de ku şanoya lehengê diramî yê xwe veşartî henera **tiracîdî** bû.

Têrma kurdî (direm – dara) di şanoya girîkî kevin de.

Ew pîrê teryog, kurdê yezîdî bergên bizinê li xwe kirî, û di dor koma bawemendên pereştiya royê dikirin re digerî. Ew valahiya sêncî li dor xwe çêkirî, bi kurdî jê re dibêjin **dara (der)**. Ne dûre ku têrma girîkê(dromoc) bi wateya (gerwera rewanê),ji wê têrma lîstoka şanoyê - direme- cihê pêşkêşiya êşe ye.

Setêre.

Hatiye navkirin lîstokvan(actor) bi bêjeya

setore, ji rê teryog (ter, der) hatiye. Ew pîrê di dor xelkê bawermend re gilover digerî valahiyek pîroz çêdikir ji bo ku xwedêyê mezin bi teşeyê **Tekiş** (nêrî) bibe. Bêjeya Sertêre wiha çêbûye (sa) ji navê nîsanderê ya Vîdî ye, ter- der ji kurdî ye, bihe ketiye bûye setêre.

Teatr (Tiyetir, Ş a n o g e h) .

Tiyetir ji Vîdî- Arî **dhi** (dîtin, pêhay dibe) û bêjeya kurdî **dî, dîtin**. Ango ew dera (cihê) dîtinê ye, cihê sêrkirinê ye. Niha têrma **tiyetro** di piranya zimanê Hindo- Awrupî de bikartê.

Dirame (drama).

Têrma dirame ji bêjeya kurdî (der- dara) hatiye, û paşkîta **me** Vîdî pêketiye.

Komîdiy (Comedy).

Ji kevin ve bêjeya komîdiye bi wateya şahî û kêfê hatiye. Ew ji gome, ew cihê dibinê zemînê de gom (şiket), û pez dikirê, an cihê tê de pez bi xwerindidina(alîf). Li ba kotiyên gava pezên xwe li destpêka biharê dizên dibû roznama saleke nû, royek nû.

Gava pezên xwe dizan şahiyek mezin li ba bapîrên Kurdan çêdibû, şahî bi koman e li dar dixiştin. Dibû şahiya serê salê(roja nû) Newroz- sala nû- roja nû.

Beşe dudiyê ji medya ye, koka xwe Vîdî **medhe (mey)** ye. Ew şahiya weke serxweşiyêye , ew kesên tev şa û bi kêf in. Ew kesên

hemî serxweş.

Defremp (def+ rim).

Defrim destpêka karê olî tercîdî ye (lavj û stiranên vejîna cedî < tek, tekiş>)bû. Li destpêkê dikirin borbor û qêrqêr got (ayet) dixwendin û sema dikirin û li dor hev digerî, û bi rimê li defê dixiştin, remprempa rîmê û awaz jê bi derdiketin. Ev borboriya cadoyî şana komkirina hêzên mêran ên moralî û giyanî bûn, wê qêrqêrê yekîtk razberî di nav hemî kesên ezbetê de çêdikir û bi xurtî heve girêdidan.

Ew pîrê Kurd yê ku bergê çermî li xwe dikir, xwe dikir qeşmerê olî û di dor kesên bawermend re digerî, der û dîwarekî derûnê çêdikir û gotin dixwend û lavj dikir. Ev kirar di boneyên olî û leşkerî de dikirin, û bergeriya xwedêy cedî(tekiş) dikirin, di boneyên leşkerî de jî ku pê dijmin û neyarên xwe bitirsînin. Ew cih nav lêdibû direme, ango ew dera ev kara lê tê pêşkêş kirine. Eriştî dibêje: Defremp ji Esiya biçûk derketiye.

Şahmar.

Li gor têtalên Hêtîtan, ku rim xesyeteke ji xesyetên xwedêyê birûskê (pirîsk) ye, bi teşeyê marê bi dubaska ye.

Li devera loriştanê (golar) pîrozkirina şahmarê sipî li pêş bû. Li sala 1812 an serbazekî înglîz dibêje: Kurd li çiyayê Hemewendê



mehrecana rizgarbûna wan ji Ejdihayê Ezdihak li dar dixin. Koka bêjeyê Vîdî – Ariye ji (axi- bydhn) heye. Hêjayî gotinê ye ku Kurd li cîhanê miletê tekaney ku şahmaran pîroz dike.

Dewrêş (Devrişî)

Kurdan ta roja îro bi vê bêjeya Vîdî – Arî bi kartîne. Bi navê qelenderê **yoge** nas dibin. Ev bêje bes di zimanê kurdî de bi kartê. Bi demê re bû têrmek olî **jep yoga**. Ev bêje wih hatî kişandin. Reça bi kurdî xwestek e, berger e. Rîsî Hindo- Awrupiya dêrîn e. Dev bi Hindo- Cirmanî û Vîdî – Ariye. Wateya xwe xwedê ye (dêwas, dêw, zivis). Dewrîş, ew kesê bi dev berger û lavjan ji xwedê (Dêw) dike.

Yoge (Yoga).

Yoge koka xwe ji bêjeya êge (tûjkirin) ye. Seydayê wê bi gyry nas dibe, ew ji bêjeya gor (bi hêze).

1- Hatha- yoge: Serdeştiya li govde, ji lêkera hatime.

2- Karme- yoge: liva diruşt. Ji lêkera kar e.

3- Bhakt- yoge: Ji b h a r e

4- Jnyana- yoge : Ji zanîna yoge ye **11**

Metirsiya vayrosa «Korona» ne derew e

Zelîxan Cimo

Vayrosa «Korona» yan «Kovîd 19» li heyva Berfenbarê ya 2019an, li «Sînê», li bajarê «Wohanê» derket. Paşê, li piraniya welatên cîhanê belav bû, bi milyonan kes vêketin, bi sedhezaran jiyana xwe ji dest dan, tirs û xofeke mezin di nav xelkê de çêkir, bala ragihandina cîhanê bi ser xwe ve kişand, saziyên tendurîstiyê û dewlet li xwe heyirandin, ziyaneke mezin gihande aboriya welatên dunyayê û hîn jî berdewam e.

Welatên ku, ji tevan pirtir ziyar ji vê bobelatê dîtine, Amerîka, Spaniya, Îtaliya, Birêtaniya, Firsnsa û Rûsiya ne. Lê, siba wê çawa be em nizanin, ji ber ku, pêla wê guhêrek e, û ne dûre guhertinekê di sîstema navdewletî tev de de çêbibe. Pir nêrînên cuda bi sedemên derketina

vê veyrûsê û vegirtina wê ji gelek aliyên derketin, ta niha li ser yeknêrînê erê nekirine, û tu derman ji bo dermankirin û pêşparêziyê jêre nedîtine. Tenê tev li ser hin mercên xweparastina jêvegirtinê xwedî yek nêrîn in.

Yanê, weke xuya dibe metirsiya wê hîn heye. Lê, ger mirov wan şert û mercan bi cih wîne, wê kanibe xwe biparêz e. Ew şert û merc jî ev in: 1- Di mal de mandin. 2- Dûrketin ji deverên xirebaliq lê heye. 3- Ger mirov neçar bû derkeve, divê berdevokan li xwe ke, û ta jê were xwe ji yê derdora xwe bi dûr keve. 4- Carbicar her ku, destê xwe bi tiştê kir-berî ku, bavêje dev an bêfil an jî çavên xwe - baş dora (20) saniyan bi sabûnê pak bişo, û ger li der ve be bi îspirto yan bi şênberêke din e paqijiyê destên xwe paqij bike. 5-



Paqijkirina alavên xwarin û vexwarinê, destokên deriyan û penceran, kilîtên êliktirîkê, lûle û tevlokên ava germ û sar bi şênberên paqijiyê bi awakî rojane. 6- Qedexkirina çûnûhatinên civakî, silav û ramûsandinê. Ji ber ku, ev vayrosa ne xuya û bi tirs e, ji mirovên vêketî yan ji ser tiştên ku, vayros li ser dere mirovên din, û ji ber ku, hîn vayros azad e û bi dawî nebûye, yanê hîn metirsiya wê li dar e; Vêca, pêwîste em tev haje xwe bikin, û bi wan şert û mercan pêgir bin.

Xebatkarê ... Dûmahîk

zanîngeha Şamê dixwîne, lê ji bertêkilya wî bi siyaseta û xebata Kurdewariyê re, ew gelek caran hatiye zindankirin û nema karîbû xwendina xwe bidawî bîne. Vêga, Apê Ebdella li welatê Swêdê dijî.

NEWROZ hêviya temenekî dirêj, bê derd û xem û tendurîstiyêke qenc jê re dike, û bila her ew şad û bextewer be.

Gelê Kurd, xebatkarên doza xwe jibîr nake.

Dîroka hin ... Dûmahîk

5- Raja- yoge : pêşxistin yoge. Koka xwe ro ye.

Japa yoga: wateya xwe pispisî, û denkirins nizim, an pejiwandina olê ye. Ew jî pîrgotin û lavjîkirina ji xwedê ye.

Bêl (bel).

Koka vê bêjeyê Hîndo -Ariye bely. Bi wateya nas û berz e. Bi inglîzî bold e. Ev bêjeya derbas pir zimanan bûye (somerî, Ekedî, Rûsî, bilocî). Li rome di serdema

şahan de destek (komît) bi navê byle(komîta nasan) hebû. Navê mîletê **Bilocî**. Ango mîletê nas berz. Navê desteya dewlemendên Hêlinên - **Elîzon** byle bû.

Xweşxewanên olî di perestgeha **Tekiş û Beran** de bi van navan bû (got: kurdî ye. Ayet: girîkî ye. Gat: Avîsteî ye. Geyetrî: Denbêja perestgehê ye sênsêkrîtî ye ,ayetên Quranê). Li çiyayê kurmêç gundê Bêlê heye.

Dirûmê: deşt an gewera

ku hespan lê disamînin. Li herêma Efrînê kaniya **dirûmê** heye nêzîkî deşt kitxê ye.

Kin: (Kin: Kotî ye. Kene: Simerî ye. Kind» gund»): Kurdî ye. Ken: Semî ye). Bi van wateyan dihate zanîn: Welat, herêm). Dera mirov lê rûniştîye. Navê pašên kevin **serkin** an sergon. Ango serekê gund.

Ser: Bi kurdî ser . Bi firensî: Sieur. Bi inglîzî: Sier. Bi Sensêkrîtî: yr. Wateya xwe hêz e.

Hirî: hirke: Hiriya miyê, kincên rehîban, cireyek ji miyan.

Messi: Mî ye. Li ba Girîkan kurê xwedê ye. Ji bêjeya kurdî **hirstos** hatiye.

Jêder:

- **Ariya dêrîn û Kurdiştana herdem**
- **(Kurd kevintirîn gel in)**
- **Selewet Golyemof**
- **Wergerandin ji Rûsî: D. Îsmaîl Hsef**

Piştî 34 salan Navê kujerê OLOF PALME

hate ragihandin

Desteya NEWROZ

Roja Çarşembê 10.06.2020 an, di kongirekî Rojnamevanî de, Serdozgerê Giştî yê Swêdê, bi fermî navê kujerê Olof Palmê ragihand!

Di vê kongreyê de, serdozger diyar kir ku kujerê birêz Olof Palme kesekî Swêdî ye, navê wî Stig Engiştrom e, ji sala 2000an ve miriye. Ji ber ku kujer ne sax e, ew vê dosyayê digre.



Olof Palme, serokê Partiya Sosyalişt a Demokrat a Swêdê û serokwezîrê dewletê bû, şeva 28ê Sibata 1986an, di dema ku ew û malbata xwe



ji sînemê vedigerin malê, li ser destê kesekî nediyar bi du guleyan tê kuştin.

Palme, bi raştgoyî, û hilwestên xwe yên rexnegir û mîna siyasetmedarekî çep navdar bû. Li hemberî kiriyarên rijîma nijadpêrêsta Afrîka Başûr û Israyîlê xwedî hilwest bû, herweha, wî navê PKKê xîstibû li şteya terorê.

Di lêkolînê de, goman pîralî û belawela bû, tilî bi ser gelek alî û dewletan de çû, mîna Nazi yên Swêdê, CIA, PKK,

MUSAD, Sovyêta berê, Yugoslavya... û hwd.

Dewleta Turkiyê ku wê demê di bin destelata leşkerî ya Kenan Evrîn de bû, bi hemû hêza xwe, xwest Kurdan bi kuştina birêz Palme gunehbar bike, mîna çawa îro jî serokê wê Recep Erdogan hewil dide ku Kurdan bi terorê nîşan bide ku gihaye aştêkê nayê bawerkirin. Erdogan radighîne ku xwepêşandanên îro li Emerîka bi rêve diçin, ew ên ji ber kuştina mirovekî

reş li ser destê polîsekî spî ku bûye cihê dax û mixabininyeke mezin, dibêje, destê Kurdên Rojavayê Kurdistanê di wan xwepêşandana de heye!.

Di vî warî de, hêjayî gotinê ye ku birêz Mihyedîn Şêx Alî/ Sekreterê Partiya me di axaftina xwe ya li Perlemanê Ewropa roja 12.12.2019an de got:

«Dewleta Turkiyê, ji bo ku raya giştî li dijî Kurdan tû bike, di dema terorkirina nemir Olof Palme de, bi hemû hêza xwe ya ragihandinê, wê xwest Kurdan bi kuştina Palmî gunehbar bike. Herweha, bi hewildana kuştina Papa yê Vatîkan, xwest bi sextekarî vê tewanê têxe stoyê Kurdan!».

Li Enqerê ciwanê Kurd ê 20 salî ji ber ziman û strana Kurdî hate kuştin!

Roja Yekşembê 31.05.2020 Z, demjimêr 10.30 ê şevê, ciwanê Kurd ê 20 salî Bariş Çakan, bi sîcê ku wî li kolanê guhdariya strana Kurdî ji Mobayila xwe dikir, toşî êrîşeke hovane ji bal komek xortên tirkan hat, ew ên ku laşê Bariş dane ber kêran û di encama birînên ku gihane dil,


jiyana xwe ji destda!..

Bêgomane ku ev tewana kîndar, yek ji encamên belavkirina çand û gotara kîn û zikreşîya dewleta turkiyê sebareti gelî Kurd e, wekî çawa hin melayên wan, kuştina Kurdan raşt û diruşt dibînin û bê şerm û fedî ji xelkê re belav dikin, rê li pêş nijadpêrêstî şer û kuştinê dûz dikin.

Ango, xwîna Xortê Kurd ê bê sîc û bê guneh, ji berpirsên dewleta Turkiyê tê xwestin!.

Bila Cihê pakrewanê Kurd bihuşt be, serê gelê Kurd sax be, û bila her kes zanibe ku bi kuştinê gelê Kurd ji holê ranabe, çavên wî naşikin, ji bo doz û rûmeta xwe ya netewî, her û her, bê westan ew ê

xebata xwe bidomîne!.



Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de